

## "Em naxwazin aloziyên Emerîka û Rûsiya bibin sedema têkdana Kurdistana Sûriyê"

**Kurdistan** Cîhan Xidir



Ev demeke li Kurdistana Sûriyê, di navbera hêzên Emerîkî û polisên serbazî yên Rûsiya de alozî derdikevin, û ev yek jî dibe sedema rêgirtina rêyên sereke li pêş

welatîyan, û bûye cihê nerazîbûn û tirsê xelkê Kurdistana Sûriyê. Li ser vê mijarê Rojnameya Kurdistana nerîna welatîyan werdigre. Îmad Ehmed ku welatîyekî bajarê

Girkêlegê ye wiha dibêje, bi aloziyên Emerîka û Rûsiya li ser erda me, rewş xerabtir dibe û tirs dikeve nava xelkê de ji ber ku alozî di navbera du ji mezintirîn hêzên

cîhanê derdikeve, lewma niha xelk li hêviya paşeroja xwe ne û ti kes nizane dê li deverê çî bibe. Semer Mihemed jî wiha dibêje, raste Emerîka behsa vekişandina ji deverên me kir, lê

piştî ku nas kir dê Rûsiya were deverê careke din ji biryara xwe poşman bû, û got dê ewê zeviyên petrolê biparêze, niha bi aloziyên herdu welatan devera me berev çarenivîseke

nediyar ve diçe, û pêwîste çareseriyek ji vê pirsgirêkê re bê danîn, em naxwazin aloziyên Emerîka û Rûsiya bibin sedema têkdana Kurdistana Sûriyê.

## Ebdula Gedo:

# ENKS di nava Îtîlafê de karên xwe berdewam dike

Kurdistan- Soz Xelîl

Ebdula Gedo, nûnerê Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS di nava Hevbendiya Niştîmanî ya Hêzên Şoreş û Dijberiya Sûriyê de ji Rojnameya Kurdistan re wiha dibêje, niha wan komîteyek ji bi şopandina bînpêkirinên ku li Efrîn, Serêkaniyê û Girêsipî pêk aniyem û dê karên wan di vê derbarê destpê bikin, herwiha ewê di nava Hevbendiya Niştîmanî ya Hêzên Şoreş û Dijberiya Sûriyê berdewam bin.

\*Niha di navbera Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS û Hevbendiya Niştîmanî ya Hêzên Şoreş û Dijberiya Sûriyê de rêkeftineke nû hatiye kirin, hûrguliyên wê rêkeftinê çi ne gelo? - Di hefeteya duyem ji sala 2020an rûniştinek di navbera Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKSê û Hevbendiya Niştîmanî ya Hêzên Şoreş û Dijberiya Sûriyê (Îtîlaf) de, li Stenbolê lidarket, piştî rawestandina endametiya Encumena Niştîmaniya Kurdî li



Sûriyê ENKS nêzikî sê mehan, bi sedema bînpêkirinên mafên mirovan bi dijwarî di êrîşa grûpên çekdarên ser bi Îtîlafê ve ligel artêşa Tirkîyê li çend deverên Kurdistanê Sûriyê mîna Serêkaniyê û Efrîn û Girêsipî. Niha rêkeftinê çêbû ku komîteyek hevbeş ji endamên Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKSê û

Hevbendiya Niştîmanî ya Hêzên Şoreş û Dijberiya Sûriyê (Îtîlaf) pêk tê, bo şopandina bînpêkirinên li Serêkaniyê û Efrîn û Girêsipî, herwiha da ku kar bê kirin bo vegrandina koçberaên wan deveran ji bo sermal û milkên wan û jiyana xweş û normal dûrî şer û tûndiyê derbas bikin, ku ev yek jî mafê wan yê sereke ye, ku ev demeke jê pêpar mabûn,

û rastî zehmetiyan dihatin, lewma pêwîstiya damezirandina vê komîteyê hebû. Herwiha Emîndariya Giştî ya Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKSê biryar da bo vegera nûnerên xwe yê di Îtîlafê li ser karên xwe di rêkefta 172020an de./1/

\* Berya demekê hun di civînên Îtîlafê de amade

nedibûn, niha hun amade dibin, pêwendiyên we çawa ne? [?][?][?][?]

- Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKSê dixwaze ku berdewam be di nava Hevbendiya Niştîmanî ya Hêzên Şoreş û Dijberiya Sûriyê (Îtîlaf) de ji ber ku ew û Desteya Bilind ya Danûstandinan ya Sûriyê, opozîsyona rasteqîne û fermî ne ku civaka navdewlî danpêdanê bi wan dike û li ser asta cîhanê û herêma jî danpêdankirî ne, Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKSê bi rengekî cuda li pêvajoya siyasî ya Îtîlafê temaşê dike, û ew ne razî ye ji pêvajoya Îtîlafê ya leşkerî, ku grûpên çekdar pê bradibin.

\*Ev demeke behsa nêzikbûna ligel PYDê tê kirin, gelo ev yek mumkine, derfetên vê yekîtiyê hene? Nêzikbûna di navbera Encumena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKSê û Partiya Yekîtiya Demokratîk ku bi PYDê tê naskirin, ku hun tînin ziman, pêwîstiya wê bi bîngê, rastî û eşkere û zelalbûnê ji aliyê wê

partiyê ve heye, ta niha ti gavên xuya û diyar nehatina avêtin ji aliyê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê ve, tiştê girîng ewe, gelo têkilî û helwestên nû ji Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê de peyda bibin, yan dê yê kevin bimînin û xwe ji yekîtiyê birevîne, têkilî bi rejîma Esed re, ev helwest ji opozîsyona Sûriyê re nebaş e.

\*Egera nêzikbûna ligel PYDê, pêwendiyên we ligel Îtîlafê lawaz nakin? Eger Partiya Yekîtiya Demokratîk ku PYDê bikaribe bi rengekî serbixwe, siyasî û rêxistinî bixebite, li gora prosesê siyasî ya di bin çavdêriya Netewên Yekbûyî de, ligel rikberiya Sûrî, dê ew nêzikbûn were encam dan.

\* Tu rewşa niha ya Kurdistanê Sûriyê çawa dibîne? Rewşa Sûriyê gelekî aloz e, û divê çareserkirina pîrsa Sûriyê li gor beyannameya Cinêv1 ya sala 2012an be û li gorî biryara 2254 be.



Raid Mihemed- Hewlêr

Ji dest pêka ku Mirov li ser goka Zemînê dike, û çavên xwe vekir, û hat hilbijartin ji hemî Zindîweran ku bû xwedî Mêjî û Raman, ew dixebite û kar dike ku Jiyana xwe pêş bixe, Voltêr dibêje: "tu alozî nîne û çendî zemet û qurs be û mêjiyê Mirov nikaribe çareser bike " Ji ber vê yekê Mirovatî her dem li pêşketinê digere, nexasim ku Civakê rê Geşepêdana di rîya Yase û Cîza û hebûna Çaksazî û Qebûlkirina

## Geşepêdana şîyanên kesayetî, şêwe û rêbend

Ramanên nû, her wiha vekirin ser Cîhanê ku ew bûye Dergehê serekî ji vê yekê re, helbet di reşa Şer û cengê de, hebûn dikeve metirsiyê de, û Mirov li Xweparêziyê digerin, derfetê Xwepêxistina Kesayetî kêm dibin û dergehên core cor tînin kilîtîkirin, ji bilî ku ev rê tê Çandin bi Mayînan, heger kesek mijûl bibe û bixwaze di vî warî de xebatê bike û xwe pêşbixe, wê tûşî astengiyên bibe, Hunera Geşepêdanê Şîyanên Kesayetî pir girêdaye bi rewşa Ewlehiyê, ji bilî pîrbûna Defetan û belavkirina wan bi rengekî Demokratîk, bê ku regezperestî hebe, wiha jî berûvajî vê yekê hin kesayetên navdar û nimûne hebûna xwe

ji nava êş û kêmayiyên mezin vejandin, û karibûn xwe di qade û gorepana Mirovatîyê bibin hejmareke pir bi nerx û buha, ku bûn xwedî serkeftinên mezin di nav mîletê xwe û bûn Nimûne ji xelkên cîhanê re, lê wiha jî kirdar û xwezaiya mirov li Ewlehiyê digere ji bo Jiyana xwe biparêze di rêza yekem de û di Rêza Duyem ji bo xwe pêş bixe, ji ber vê yekê Pirofîsorê Navdar KARIL YONC di derbarê vê tekez dike ser (Devera Ewlehiyê û bîhîndanê) ev dever ya ku mirov têde dike û hest bi Ewlehiyê dike ku ji 3 tiştan pêk tê gorî P. YONC gotiye ew jî :1- Devera têde jiyana dike. 2- karê ku nan jê dixwe. 3- Ew kesê ku bi wan re dike.

ELBIRT ENÎŞTAYIN jî gotiye: " Mirov bi Ewlehiyê hest dike, dema Cihekî dibîne rêde dijî û pêşeyekî jê nan bixwe, û kesên ji wan hez dike û bi wan re dike ". Bi ser vê yekê jî metelokeke Hindî heye pir kevînar e dibêje " heger tu xanîkî bibîne ku têde bîje tu bextewerî, û heger tu tiştêkî bibîne li ser bîjî, tu Zîrek î, û heger tu kesekî bibîne li gel wî bîje bi evîni tu kêfxweş î, û heger ev hemî tişt hebin li cem te tu dewlemendê mezin î " Ji ber çima ev buhaya mezin dane Ewlehiyê..?? Ji ber ku mirov pêşxistinê dike armanc ji bo mirovatîyê, ku Mirov pêwîstiya wî ya herî mezin e, dibe ev tiştên navbûrî di rojhilata

navîn de peyda nabe, ku ji sedsaliya bûrî ta niha di nav şer û kuştin û koçberî û talankirinê de dike, ji ber vê yekê Civakên Rojhilata Navîn ji Neteweyên core cor, li paş man e, ji bilî ku mirov kelpîçê yekê ye di Pêşxistina Civakê de, lê berûvajî vê yekê Bandora Olî bi taybet ya perest û şaş bû bîngê ji rawestandîna û paşxistina mirovan û neqebûlkirina Mafê Mirovan û mafê Jinê û zarokan, û Dîmoqratiyê qedexeyê di van deveran de, ji bilî ku ev Civakên Navbûrî di ser Hoz û Êl an dijî û Şaristanî û Civaka Sivîl nayê Qebûlkirin, û Hêzê Hêza Olî ya şaş e, û Hêza Hoz û Êlan e ji bilî Partîbûna çav girtî û ezeziyê ku di

nav kesayetiyên belav û peyda dibe, û ew kesê bixwaze xwe ji van kirasên rizgar bike û Geşepêdana Şîyanên Kesayetîya xwe bike, ew xwe û Jiyana malbata xwe dixê di nav dojeheke mezin de, ji ber ku nebe di van Civakên paşketî kesek ji ref û Kerî derkeve, û ew bi xwe dibe biyanî di nav Civaka xwe de, û ji bo wan Armancê xwe pêk bîne, berê xwe dide Welatên Rojava yê pêşketî ji bo xwe li wir bibîne û karibe bîjî wekî Hizir û ramanên xwe, lê wiha jî û bi ser vê yekê de hin kes hene li welatê xwe mane û hewil didin Civaka xwe pêş bixin û derfet bidin kesayetiyên ku Şoyanên xwe Geşepêdanê bikin di hemî waran de.

# Mirina li ber siha alaya Kurdîniyê



Bêwar Brahîm

Wa sibehên rojê, di vê navrojê de bangî selefên siwarên dewrê berê bike bila li ser benderên behîdariyên me bicivin, bila gencîneyên bend û şîretên xwe ji nû ve di zevîyên jiyana me de biçînin û me ji xefletnameyên dexok û bê soz agahdar bikin, bila wan tenbînameyên derengmayî bi rol bikin û berê padîşahên wêrekî û cegerdariyê bidin cenga serfiraziyê di berên rast de, da hêzên ji mijê berbakin û yên rastiyê bi cih bikin. Mamoste Ekrem, li ber siya koçkirina mêran wê şîrqîna qamçiyên qêrînên wan siwaran li ser pišta hespên dîrokê bilind bibin. Wê bi yek dengî bangî me bikin, bila xweşmêr û çavreşên vê qonaxa reş û mijgirtî çog-şikestî nebin, bila serketinên me, şûn û şopa me rênasên we bin, ji alazên xakê dûrnekevin, şaştîyên me dúbare nekin û wan bikin bingeh di pêkên pêvajoya xwe de. Pênûsa mamoste Ekrem jî qamçiyekî bi şîrqîn bû li ser dêmê durûtî û sextekariyê. Ji min re digot: Qet bawer neke ku mêranî di welatê me de bibe koletî, dilsozî jê bar bike û hevgerîtin lê bibe bar. Lê peyv bûn ka û berba bûn û welatê rojê bû kampên rebenî û hejariyê, bû welatê xezebê, yê dexsê bû welatê bender û balafirên xerîbiyê. Hê rojan xwe di bin baskên kevnariyê de veneşartine maye dîdevanê taristana newêrekiya li ser tuxubên serhişk, ev sînor û serhedên ku rê li ber bilindkirina her alayan di azmanê xwe de vekiriyê, alayên reş, alayên dagirker, alayên destreş û alayên ne



ala tev di vî azmanî de vîdikevin û dikenin û bi tenê alaya Kurdîniya resen, alaya roja azadî û serxwebûnê paşdemayî kirine. Waaa sibehên rojê, qehweya sibehên me li ser agirê wêranî û mîratmayinê, li ser agirê cînosaydkirinê difûrin û dilmafên me tev mane dîlê destê dema reş û bazarên reş û dilên reş. Mamoste Ekrem, me soza xweşmêriyê dabû welat, soza cangorî û parastinê, ne bi destê me bû ew soz berbabû û welat li nav bager û bahozên tewanbar li hevgeriya, bû mêrga toldarên şevrevok, bû daristana hov û dirindeyan, bû welatê xwîna rijyayî û

kezebên pijyayî û devên dirûtî û girêdayî, bû war ji gundên kaviyê û bajarên ji hev veqetyayî. Waa welatê alaz û talazan, çima destên tolaz bûne bazirgan û qumarçiyên xwîna te? Çima di bin konên mirin û behîdariyên me de sergovendî bi milanî digerin û deriyên navendên dilşadî û dilanên me girtî mane? Kêfa ji tîrsa bûye padîşah û dilşadiya ji bo kêfê li me bûye mêvan. Em nema zanin bikenin û ji giriyê serê heşt salan em zuhabûne. Di navbera kenê lertzok û giriyê zuha em bûne peykerên ji kevir. Em ê berê xwe bidin çî azmanî û bipirsîn

çima bayê kur erdheja wêraniya civaka me bi xwe re anî, çima şalên şermîniyê çirandin û yên rû-şuştîyê pê mejiyên pûç û vala nuxumandine. Em zarokên zîrekî û serweriyê ne rojekê me serê xwe ji qelsî û lawaziyê re neçimand û em naçimînîn, aniya me nîşana rojên girane di berên mîrxasiyê de û sênga me mertalê bervedêriya êrişên hêzên reş e di qadên serketinan de, waye Zimar û sihêla ne dûrin hê jî sirûda lehnegiya me dilorîn. Doh bû min got karwanên lehngên me di oxiran de ber bi dawî dibin, lê daxa mirinê zimanê min kewandibû û nehişt ez bêjim ku pêvajoya

wan siwar û lehengan rojekê venamire, ew oqyanosên bê benderin ne noq dibin û ne vedimrin. Rê ji me re nebû em bi destên paqij berevaniyê bikin em bi xakê re ne xayin bûn û xak jî bi me re xayin neket, em man li pey ronya roja lêvegera Kurdîniyê, me rê xwarnekir lê felek bi me re çep geriya û riya kadizan gelawîjên me veşartin û karwankujên xapînok şanî me da. Dîsa em newestiyên û nerawestiyên em li ser wê pêvajoyê meşiyên û em qet bernadin em ê li ser bimeşin. Ey xwedan bila li ser destê te û destên Barzanan vegera

leşkerên Roja me be û li ser destên van leşkeran hîlbûna roja Rojava ya me be û li ser destê Rojava tolhildana xwîna welat û xaka me be. Ey Xwedan li ber siha te û ala roja zer û çiyayên zer nêzîk ne dîr serxwbûn û azadiya kesk û sor û zer bala û berz bibe. Bila serê kurd û kurdîniyê sax be, Bila serê rêbaza nemiran sax be Bila serê nivîskariya resen û siyasetmedariya resen sax be, yên weke mamoste Ekrem Mele ne bê dondene her Kosekanekî kîkî li ser pehnafê kepezê Kikan dondê wî ye, her dilopek xumav ji pênûsa wî cihwarê wî ye.

## Idlib di navbera berjewendiyên Rûsiya û Tirkîyê de

Kurdistan- Seîd Mûsa  
Hêzên rejîma Esed bi alîkariya asmanî ya Rûsiyê li rojhilatê başûrê Idlibê 15 dever kontrol kirine û derbasî navenda ajarê Meret El-Numan ya Idlibê bûn. Tirkîyê jî ragihand ku ew dê bersiva her êrişeke artêşa Esed bidin li ser xalên çavdêriyê li Idlibê. Hêzên rejîma Esed li rojhilatê

başûrê Îdlibê Hamidiye, Bsîda, Kefer Basîn, Babolîn, Es Salîhiye, Dar es Salam, Deyr Xerbî, Tkad, Sihyan, Maarhatat, Babila, Qahira, Masaran, Dana û Kefer Rumaê bi dest xistin û derbasî navenda Meret El-Numan navçeya herî mezin a Idlibê bûn. Ji aliyê din ve Wezareta Berevaniya Tirkîyê ragihand ku ew dê bersiva her hewlekê artêşa rejîmê bidin li ser xalên

çavdêriyê li Idlibê metirsî bin. Li ser vê mijarê Mihemed Hatim wiha dibêje, niha Idlibê di navbera berjewendiyên Rûsiya û Tirkîyê de maye, wek hun dizane niha rêkeftinê di navbera herdu aliyandê heye ku grûpên çekdar jî Idlibê jî bo Efrîn û Serêkaniyê û Girêsipî wek gaveke destpêkê werin veguhestin, û êdî rejîma Esed jî destê xwe deyne ser tevahiya parêzgeha

Idlibê û ew çekdar jî bikevin riwê HSD û biçin deverên Kurdî, raste li ser ragehandinê Tirkîyê Rûsiya bi bînpêkirina rêkeftinan tawanbar dike, lê di rastiyê de tenê ev li ser medyayê ne, lê di jêr maseyê de tiştêkî din xuya dike, û her alî jî li berjewendiyên xwe digre. Cemîla Omer jî wiha dibêje, yê ku dibe qurbanê vî şerî helbet welatîyên sîvîl in,

lewma ew ketina nava agirê berjewendiyên herdu welatan, herwiha Cebhet El-nusra jî zehmetiyên ji xelkê re derdixê, û bacan li ser xelkê wê deverê li ser derketina wan ferz dike, herwiha ni sed hezaran xelkê wan deveran koçber bûne û dê bibin bela li ser serê Kurdên Efrînê, û ev yek jî dihêla ku demografiya deverên Kurdî hêsantir bibe.

# Guherandina peyvên Îranî di Erebi de



Hisên Mihemed

Tesîra erebî li ser zimanên din, bi taybetî zimanên misilmanan, bi berhefirehî tê zanîn û gelek tê behskirin jî. Lê pir kêmtir behsa tesîra zimanên din li ser erebî tê kirin. Lê çawa ku erebî tesîr li gelek zimanên din kiriye, wisa gelek zimanan jî bandoreke mezin li ser erebî kiriye. Zimanên îranî yê wê farisî, kurdî, pehlewî û avestayî jî yek ji wan binemalên zimanan e ku herî zêdetir tesîr li erebî kiriye, bi taybetî bi wê yekê ku erebî gelek peyv ji zimanên îranî wergirtine. Wek zimanên din jî, erebî gava ku peyvên biyanî wergirtine, ew kê-m-zêde li gor şert û mercên xwe yê dengnasî guherandine. Mijara vê nivîsara me dê çawaniya guherîna peyvên esil-îranî di erebî de be.

## GIŞTÎ

Giring e were gotin ku hemû peyvên îranî ne yekser jî zimanên îranî ketine erebî. Bi taybetî peyvên ku ji mêj ve ketine erebî, pêşî jî zimanên îranî ketine aramî û paşî jî aramî derbazî erebî bûne. Sebeb ew e ku aramî berî du-sê hezar salan li Rojhilata Navîn zimanê danûstandinê bazirganî û idarî bû. Zimanê aramî bi xwe jî hinek guherandin li wan peyvên kirine berî ku ew derbazî erebî bibin.

Gelek ji zimanên riwek anku nebatan, kevîrên bihagiran û berhemên din yê bazirganî jî zimanên îranî yan jî bi rêya zimanên îranî jî

zimanên Hindistanê yan Çînê ketine erebî.

Bo nimûne:

- bellûr (krîstal, cam) ji belûr
- feyrûz (tebesî, turkuwazî) ji pîrûze
- hal, heyl (kajîle, kakule) ji "hêl"
- 'ibrîq (misîn) ji "ab" (av) "rîxten" (rêtin, riştin, rijandin)
- kenz (gencîne, xezîne) ji genc
- lazewerd (lapis lauzli) ji laciverd
- lîmûn (fêkiyekî tirş) ji limo
- misk (madeyekî bêhnxweş) ji muşk
- nisrîn (gulek) ji nesrîn
- sebanix (riwekek xwerbar) ji spenax
- sunbul (gulek) ji sunbul
- xiyar (sebzeyek) ji xiyar
- yaqût (gewherek) ji yaqût
- yesmîn (gulek) ji yasemîn
- zencebîl (riwekeke biharatî) ji zencebîl
- ...

Piraniya van peyvên û peyvên din jî yê zimanên îranî wergirtî bi şikl û qalibê xwe cuda ne ji peyvên erebî yê xwemalî ku bi piranî jî rehên sê konsonantî (dengdarî) hatine çêkirin.

Hinek ji van peyvên hinek rehên peyvên xwemalî yê erebî diyar dibin. Bo nimûne, peyva "misk" wisa dixuye heçku

rehê wê m-s-k be lê rehê m-s-k bi xwe di erebî de heye û peyvên têkilî "girtin, hilgirtin, dest kirinê" jê tèn çêkirin. Herwiha peyva "xiyar" wisa dixuye heçku ji rehê "x-y-r" be ku wateyên têkilî "bijartin"ê jê tèn çêkirin.

## GUHERANDINA PEYVÊN WERGIRTÎ

Gelek cudahiye dengî û dirûvî (şiklî) di navbera erebî û zimanên îranî de hene. Bi taybetî dengên zimanên îranî yê wê Ç, G û P di erebiya standard û di gelek devokên erebî de jî peyda nabin.

Ji ber cudahiye dengî û dirûvî, gava ku peyvên îranî ketine erebî, gelek ji wan guherîne: hinek piçêkê, hinek jî bi diwarî. Guherîn ne tenê dengî lê herwiha kîteyî (heceyî) û avanî (struktûrî) jî bûne.

Guherînen bi wisa diwar an sivik herwiha hingê jî peyda bûne gava ku peyvên erebî ketine zimanên îranî lê ew ne mijara vê nivîsara me ya vê carê ye.

Li jêr em ê behsa sê guherînen bingehîn bikin ku du yê pêşîn guherînen dengî ne û ya sêyem jî guherîneke dirûvî ye.

## GUHERANDINA G-YA DAWIYA PEYVAN

Di zimanên îranî yê berî îslamê û yekser piştî hatina îslamê de gelek peyv bi dengê G bi dawî dihatin. Bo nimûne "bernameg" (bername,

program) û "pisteg" (fisteq).

Lê ne di erebî de dengê G tine bû loma G-ya di peyvên ji zimanên îranî ketî erebî de G bûye C yan Q. Bo nimûne:

- bernameg > bernamic
  - pisteg > fustuq
- Wek hemû zimanan, zimanên îranî jî bi demê re guherîne. Yek wan guherînan bo nimûne ew e ku ev dengê G ji dawiya gelek peyvên hatiye avêtin, bi taybetî di farisî de. Loma niha em dibêjin "bername" û di farisî de fisteq bûye "piste, pistê". Lê ew guherîna di zimanên îranî de çêbûyî, ti tesîr li ser peyvên ku berê ketibûn erebî nekiriye. Loma C hê jî di peyva "bernameg" de li şûna G-ya "bernameg" maye û Q-ya di "fustuq"ê de jî li cihê G-ya "pisteg" a kevîrdewam e.
- Hinek nimûneyên din
  - benefsec ji benefşeg (niha binefs, binefşe)
  - beydeq ji peyadeg (niha piyade, peya)
  - nemûdec ji nemûdeg (niha nimûne)
  - tazec ji tazeg (niha taze, teze)
- Ev nimûne dawiyê herwiha wek "taze" jî jî zimanên niha yê îranî ketiye erebiya devkî û li şûna G-ya kevîrdewam e.
- GUHERANDINA Ç BI Ş (ص) YAN S
- Dengê Ç heye ku di erebiya standard û di

piraniya devokên wê de peyda nabe. Niha gava ku peyveke bi dengê Ç ji zimanên din tê wergirtin, di erebî de ew bi piranî de Ş. Bo nimûne "şîk, şêk" ji inglîzî "check".

Lê berê, gava ku erebî peyv ji zimanên îranî wergirtin, dengê Ç di wan de dibû Ş (sad, S-ya qelew, ص) û kê-m caran jî S.

Ev wek tiştêkî nepayî dixuye û gelek kesan heyirî dihêle ku çima Ç nebûye C yan Ş ku gelek ji Ş zêdetir nêzikî Ç ne. Sebeb ew e ku di zimanên îranî yê berê de, bo nimûne di pehlewî û sogdî de, dengê aramî Ş bo nivîsîna dengê Ç yê îranî dihat bikaranîn ji ber alfabe pehlewî û sogdî ji aramî bû û tê de ti herfeke taybet bo dengê Ç tine bû.

Xwandanên aramî jî ew deng ihtimalen di nivîsîna bi zimanên îranî de bi Ş dixwandin û wisa ew peyv bi wî awayî ghiştine erebiyaxivan jî. Gelek nimûneyên wisa hene ku tê de Ç-ya îranî bûye Ş. Em li vê derê tenê çend nimûneyan bidin:

- şîrac (lampe) ji çîrag (niha çîra)
- şarûc (hawin, sarox) ji çarûg
- reşaş ji pehlewî erçîç
- ceşş ji gêç/geç
- Şîn ji Çîn

## Li ser sîngê Hewarê



Nehrî Goranî

Ken ji nav biskên te  
Dadirivî  
Diçûrisî  
Ji ser sîngê HEWARÊ  
diherikî  
Li ber sêmfoniya  
Kenê te  
Dîlana perzer û  
hehecûka  
Digeriya ,,,  
Va du demin  
Du hezar kovan û êş  
Di newqa de , dikolin  
Bîrîna kantoj dikin ...  
Di gewriya de , , ,  
Li ser lêva qeşa girt  
Di bêdengiya  
Lal bû  
Ew Girinjîn ,  
Ejdeha û tîfan  
Li nav zeviyên rokê  
Dûv li hev dalînin  
Hêlînan di nav pelên  
ZEYTÛN Û gîsoyên  
GÊNIM de Ava dikin  
Li ser şaxa defa  
vedinin  
Di argûna çardeh  
jehrî de  
Hêkên hehecûkan  
diceliqînîn ....  
Her ku pencre û  
pacên ewra  
Beskên xwe vedikin  
Biskên zeytûn û  
gênim hev hembêz  
dikin  
Hev radimûsin  
Tiliyên rokê dinoşin  
Kenê ,  
DEŞTA CÛMÊ û  
WAŞOKANÎ  
berve esîmana diçe  
Bi perwîn û hebana re  
dimeye .

